Bêzar

Ehmed Şêran

Here....!
Bêzar wexer be
rondikên direwîn bo evîneka
pak nebarîne.
Xwe berze bike
Dûr.. dûr.. here...
Û,
nezivire.

Dilê min
çend ma li benda biryarên te
yên kujek.
Xwezî carek te zanîba evîn çî
ye....?
Mezinatiya te ne xwenîşandane
bo xelkekî,
here bêzar...!
dilê min wekî her car nabe cih
û war.

Lê, bi êwrî te bi xap û hîla evîn
berze kir.
Ne keniya te,
ne evîna te,
min bihêle û dûr here,
bila bisojim, mîna pelatînkê bo
gulê.
Li xerîbiya
dûrî heval û hogiran rondik
barîn.

Xatirxwestin, rizgariye..
Û
Cejneka nûye bo min